Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1266 | 20-Nîsan-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Gundê Elî Gamêş



Ayşa Silêman/ Dêrik

**Gundiyê bi navê Şeref Tahir diyar kir ku di dema berê de li gundê Elî Gamêş jiyana komînal hebû, lê bi demê re ev yek roj bi roj winda bû.**

Gundê Elî Gamêş yek ji gundên ku dikeve Rojavayê Kurdistanê û girêdayî Bajarê Dêrikê ye. Bi kedîkirina sewalan û malên xwe yên kevnar tê naskirin. Di dema berê de nêzî 100 mal di gund de hebû, lê ji ber kêmbûna derfetên kar gelek malan ji gund bar kirin, niha jî nêzî 50 malî di gund de maye.

Di derbarê jiyana gundê Elî Gamêş û dîroka wî de niştecihê gund yê bi navê Şeref Tahir ji Rojnameya me re axivî.

**Rewşa xelkên gund di demên berê de**

wek nav û dîrokeke tekez ji gund re nîne. Ji ber ku dema bapîrê min li vir bi cih bûn ev gund hebû, lê tu kes têde jiyan nedikir. Di dema berê de di nav gundiyan de jiyana komînal hebû û her kesî destek dida hev, lê bi demê re ev yek winda bû û her kes bi xwe û jiyana xwe ve mijûl dibe. Her wiha di dema berê de me gelek kar bi destan dikir, jinên gund di serê sibehê zû ji xew şiyar dibûn da ku dew li meşkê bixin û berheman derxin. Di heman demê de ji şîrê sewalan mast, penîr, Lorik, lebnê û rûnê erebî çêdikirin. Dema mirov ev berhem dixwarin bi hêz dibûn. Zilamên gund yên ku sewalên wan hebû berê xwe didan bênderan û yên ku zeviyên wan hebû diçûn nav zeviyên xwe bi mehan kar bi destan dikirin. Tevî ku zehmetyên wê demê zêdetir bûn û mirov zêde ked dida, lê çêja jiyanê bêtir hebû.”

Gundiyê bi navê Şeref Tahir



Şeref Tahir da zanîn ku bapîrê wî Şeref û Hesenê Kalo ew kesên yekemin ku berê xwe dane vî gundî û têde bi cih bûne û wiha got:” Elî Gamêşa mezin û ya biçûk her du girêdayî hevin, xelkê her du gundan jî pismamên hevin tu kesê biyanî di nav me de bi cih nebûye. Dibe ku navê gund vedgere kesekî bi navê Elî ku di dema berê de gamêşên wî hebûn, lê axaftinên xwe bidawî kir û wiha got:” Gundiyan jiyana xwe bi kedîkirina sewalan derbas dikir û hemû berhemên wan ji malê bû. Lê ji ber van salên ziwahiyê û kêm derfetbûna kar, gelek xelkê gund bar kirin. Hêviya me ew e ku Rêvebriya Xweser çareseriyekî ji me re bibîne da ku em tov ji bo sala bê bikirin, ji ber ku îsal ziwahî bû û me tiştek bi dest nexist.”

# Li Kobanê kevneşopiyeke civakî: Çêkirina xaniyên ji axê

Navenda Nûçeyan

**Wehîde Ebdo Hemo xwedî ji kevneşopiyeke civaka xwe derdikeve û xaniyên ji axê çêdike.**

Wehîde Ebdo Hemo ji gundê Qorê yê Kobanê ye. Çîroka wê xwedîderketin û parastina kevneşopiyekê ye. Bi rê û rêbazên berê ji axê xaniyan lê dike.

Wehîde Ebdo Hemo qala çêkirina xaniyên dîrokî dike û dibêje, “Em axa hûr kom dikin da ku em xaniyan lê bikin. Ew xaniyên kevneşop ên ji pêşiyên me mane, em di wan xaniyan de mezin bûn Ew xanî zivistanê germ û havînê jî hênikin. Hin caran jî em bi kelpîçan xaniyên xwe lê dikin. Ewil em axa xwe kom dikin, pûş dikin nava wê û ew celba rojekê dimîne. Dûre em dikin kelpîç û heta ku hişk dibe



em pê xaniyan lê dikin.”

**‘Ez dikim di wan xaniyan de bijîm’**

Heta bi hilma wan xaniyan jî xweş e. Dayîka Wehîde wiha pê de çû: “Ez bi destê xwe wan xaniyan lê dikim û hevjînê min jî li kêleka min bi min re dibe alîkar. Ruxmî ku xaniyên min ê din hene lê dîsa jî ez ji xaniyên kevin hez dikim, dixwazim tê de bijîm. Xandî bi keda destan tê amedekirin, heta hefteyekê ez dikarim xaniyekî jî amade bikim. Di heman demê de ez xaniyê ji lawirên xwe re jî lê dikim.”

Sudoku: Bersiv 36

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 5 | 8 | 9 | 6 | 1 | 2 | 4 | 7 |
| 7 | 6 | 9 | 4 | 5 | 2 | 3 | 1 | 8 |
| 2 | 4 | 1 | 3 | 8 | 7 | 5 | 6 | 9 |
| 5 | 2 | 3 | 6 | 7 | 4 | 9 | 8 | 1 |
| 1 | 7 | 4 | 2 | 9 | 8 | 6 | 3 | 5 |
| 8 | 9 | 6 | 1 | 3 | 5 | 7 | 2 | 4 |
| 9 | 8 | 2 | 5 | 4 | 6 | 1 | 7 | 3 |
| 6 | 3 | 7 | 8 | 1 | 9 | 4 | 5 | 2 |
| 4 | 1 | 5 | 7 | 2 | 3 | 8 | 9 | 6 |

Sudoku:Pirs 37

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 6 | | 8 | | | | | 7 |
| | | | 1 | 7 | 3 | | 2 | |
| | | 5 | 4 | 6 | | | | |
| | | 2 | | | 1 | | 7 | |
| 5 | | 8 | | | | 3 | | 6 |
| | 3 | | 5 | | | 4 | | |
| | | | | 2 | 4 | 7 | | |
| | 1 | | 3 | 5 | 8 | | | |
| 3 | | | | | 9 | | 5 | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Çavên xwe şor kirin:**
Bi heman wateyê.
**Kumê me li erdê xist:**
- Em şermezar kirin; em fihêtoyî kirin; em rezîl kirin.
(Dema mirovek tiştekî nebaş dike, yan dibêje, yan jî di mijarekê de bi ser nakeve yên nêzîkî wî wisa dibêjin)
**Kumê me xwar kir:**
- Bi heman wateyê.
**Li ber xwe nêrî:**
- Li ber xwe ket; şerm kir.
**Seyan nan ji destê wî negirt:**
- Rezîl bû; perîşan bû; gotinên pir giran jê re hatin gotin.
**Serê xwe kûz kir/serê xwe xûz kir:**
- Li ber xwe ket; şerm kir.
**Xwe sar kir:**
- Xwe hetikand; xwe kêm kir; xwe rezîl kir.
**Zirneya me pelişî/zirneya me pelişand:**
- Em pir li ber xwe ketin; me şerm kir; em hetikîn.
(Dema tiştekî ku mirov pê şerm bike were serê mirov, yan xizimekî, hevalbendekî mirov li ser navê mirov di karekî de serkeftî nebe, hingê tê gotin)

**LI SER KAR, ZERER Û BÊPARBÛNÊ**

**Bi mistan ve çû erdê:**
- Zerereke mezin dît; bi ser neket; pir pîs şkest.
**Bi stima ve çû erdê:**
- Bi heman wateyê.
**Bi şeşan kirî bi çaran firot:**
- Zerer tê de heye kar tê de nîne; zerer kir; ji kar fêm nake.
Ce ye, yan genim e?
- Te kar kir, yan zerer kir?
**Çavê me dît devê me nedît:**
- Pir xweş bû lê me nexwar; pir baş bû lê para me neket.
**Şal çû bi şal, vegeriya bi qerpal:**
- Di çûna xwe de ti kar nekir, bi ser de zerereke mezin dît.
**Dema xanî dilop dike ti kes pêşiya xwedî pê nahese:**
- Dema zererek digihe yekî berî her kesî ew bi êşa wê dihese.
**Derî li ser min girt:**
- Mala min xirab kir; ez pir xusirandim; ez perîşan kirim.
**Deriyê min dada:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Piştî peymana Şêxmeqsûd û Eşrefiyê... gavên pêşveçûnê



Hevseroka Şaredariya Gel a Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Emîne Bêrem da zanîn ku wê bi rêya van lihevkirinan xebatên şaredariyê di her du taxan de bi pêş bixînin û got, “Da ku xebateke hevbeş bê kirin, wê di asta giştî de komîte werin avakirin.”**R-5**

## Platforma Yekîtiya Jin ji bo avakirina modêla demokratîk e

Berdevka Kongra Star Rîhan Loqo diyar kir ku 24 rêxistinên jinan û partiyên siyasî yên ji çar parçeyên Kurdistanê li Silêmaniyê beşdarî platformê bûn û got,“Ji bo têkoşîna hevpar, Platforma Yekîtiya Jinên Kurd li ser bingeha xebatên zanistî, siyasî, hunerî û rewşenbîrî di hemû aliyan de bi hev re ji bo avakirina modêleke demokratîk kar û xebat tê kirin.”**R-3**



## ‘Şandeyên welatên Ewropî û Ereban YPJ’ê sîwana hemû jinan dibînin’



Berdevka YPJ’ê Ruksen Mihemed diyar kir ku di demên dawiyê de gelek şandeyên welatên ereban û yên Ewropî serdana herêma wan kirin û di nav de serdana YPJ’ê jî kirin.**R-2**

## Muzîk hêza cûda ya mirov e



Mirov di jiyana xwe de her tim bi muzîkê re têkiliyeke berdewam çêdike. Di dema tengasî û bêmoralîyê de muzîk xelasiya mirov e. Guhdarkirina muzîkê mirov bi tendurist û berhemdar dike. Muzîk, tenê ji dengan pêk nayê, lê deriyê ku cîhana hestên mirovan vedike.**R-7**



**Xeteriyên li ser pêvajoyê**
Ahmet Aktaş R-4



**Li Sûriyê Sîstema Transît û qeyûmtiya Tirkiyê**
Idrîs Henan R-5

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1266 | 20-Nîsan-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# NETEWA DEMOKRATÎK MODÊLA ÇARESERIYÊ YE

Piştî hilweşîna rêjîma Baas Sûriyê derbasî qonaxeke nû bû û hêviya avakirina Sûriyeke demokratîk mezin bû. Lê piştî hatina deshilatdariya Şamê ya nû û kiryarên wê yên li dijî gelên Sûriyê, rewş aloztir bû. Niha jî Sûriyê bûye navenda kirîzên Rojhilata Navîn, tevahî hêzên hegemon siyaseta xwe ji bo berjewendiyên xwe li ser erdnîgariya Sûriyê didin meşandin. Li hember van siyasetên ku tên meşandin yekane rêya çareseriyê ji bo tevahî Sûriyê modêla Netewa Demokratîk û hevgirtina gelan e.**R-4**




## Roja Rojnamegeriya Kurdî

Di 22’ê Nîsana 1898’an de, yekem rojnameya Kurdî ji aliyê Miqdad Bedirxan ve li paytexta Misirê Qahîrayê hat derxistin. Ji ber ev rojnameya yekemîn di dîroka çapemeniya Kurdî de bû, roja derketina wê weke Roja Rojnamegeriya Kurdî hat ragihandin û tê pîrozkirin.**R-6**



# ‘Şandeyên welatên Ewropî û Ereban YPJ’ê sîwana hemû jinan dibînin’

Berdevka YPJ’ê Ruksen Mihemed diyar kir ku di demên dawiyê de gelek şandeyên welatên ereban û yên Ewropî serdana herêma wan kirin û di nav de serdana YPJ’ê jî kirin. Meraqa şandeyan jî li ser gelek xalên girîng hebû ku ji dîroka avabûna YPJ’ê û heya roja îro têkoşîna jin naskirin bû. Herwiha şandeyan ji YPJ’ê re diyarkirinbûn ku ew sîwana hemû jinan e.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**





Derbarê şandeyên ku serdana Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi taybet serdana YPJ’ê kirine, Berdevka YPJ’ê Ruksen Mihemed bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Di demên dawiyê de şandeyên cûr bi cûr yên jinan serdana Rojava dikin û bi YPJ’ê re hevdîtinê pêk tînin, di van hevdîtinan de babetên ku nîqaş li ser tên kirin çi ne?**

Di demên dawî de piştî şerê li ser herêmê me û bi taybet şerê li Bendava Tişrînê, Pira Qereqozaq û Dêrhafrê ku ji aliyê çeteyên dewleta Tirk û dewleta Tirk bi xwe ve pêk hatin, gelek rojnamevan ên biyanî yên welatên ereban û yên Ewropî serdana herêma me kirin. Li kêlek wê jî şandeyên tevger û rêxistinên jinan û jinên aktîvîst, Akadimisyan, rojnamevan, lêkolînvan, siyasetmedar, parlemeter û aborînas serdana herêmê kirin. Di serdanê wan de hevdîtin li gel YPJ’ê jî pêk hat. Ev şande jî, ji Ketelonya, Aspanya, Almanya, Îtalya, Feransa, Siwîsra, Kenda, Nêmsa, Birîtanya, Meksîko, Ajantîn, Amerîka latînî, Êngêltera û hwd... bûn. Di van hevîdtina de jî me û şandeyan dan xuyakirin ku em bi hev re hene û bi hev re têkoşîna xwe bidin meşandin.

Di van hevdîtinên ku pêk hatin, meraqê van kesayet û rêxistinên jin ew bû ku YPJ’ê di warê rêxistinbûn, felsefîk, birdozî, pisportiya şer û leşkerîbûnê de, sazûman û avakirina wê yên salên dirêj ê ku têre derbas bûye, tecrûbeyên wê yên ku çêbûne, dengvedana YPJ’ê li cîhanê û hurgiliyên wê, naskirin bû. Hem jî meraqa wan ew bû ku YPJ’ê ne tenê yekîne û artêşeke leşkerî wisa xwe birêxistin kiriye. Lê di warê rêxistinbûn, hizrî, akadimî, pisporî û pêşengtiya şer de, herwiha di hemû warên jiyanî û hevaltiyê de ew kurbûn û zanebûna ku daye çêkirin. Gavavêtinên wê yên ku destpêkê di hundir gel û civaka xwe de û hemû guhertin û veguhertinên ku hatiye çêkirin, bi çê rêbazî bû û çawa karî vê yekê bide rûniştandin. Bi taybet ku di civakê Rojhilata Navîn de jin nikare raje çekan. Û tevî ku ewqas êriş û bombebaran li ser herêm û civaka me, di aliyê fikrî û leşkerî de hebû. Lê YPJ’ê çawa ev derbas kir, zihniyeta civakê da guhertin û çawa pêşengtî ji şoreşê re kir. Li kêlek vê karî meşên xwe yên ku bi armanc daye meşandin, hîn mezitir, berfirehtir û bêtir xwe birêxistin bike, hem jî bibe dengê hemû jinan.

Şoreşa ku bi pêşengtiya jina kurd hate destpêkirin, îro bi rengê jinan pêş dikeve û yekîtiya jinan hatiye çêkirin. Di giştî cîhan û civaka me de dihate meyzekirin ku jin nikare di karê leşkerî de cih bigre, eger cih girt jî wê bi xebatên ofîsan re sînordar bimîne. Lê YPJ’ê çawa pêngav da destpêkirin, xurt û mezintir kir.

**Giftigoyên di navbera YPJ’ê û şandeyan de hate kirin bêtirî xwe naskirina çi bû û nerîna şandeyan ji bo YPJ’ê çawa bû?**

Bêtir şandeyên ku hatine tiştên ku xwestin bizanibin ji dîroka avabûna YPJ’ê gavên ku hatine avêtin. Pêvajoyên YPJ’ê têre derbas bûne, li ser çi bingehê xwe birêxistin dike û hizrê ku xwe li ser wê digre. Îro em behsa pergala netewa demokratîk dikin a ku jin pêşengtî, birêxistinkirin û sazûmaniya wê dike. Mînak di nava pergala YPJ’ê ya hundirîn de yek ji pîvanên ku daye pêşiya xwe Sûriyeke demokratîk nenavendî piralî ye, ev armancên bingehîn ên ku YPJ’ê xwe li ser birêxistin kiriye. Bêtir hîn bi jinan re pêywendî daye meşandin, da ku xîtab û parastina hemû jinan bike. Herwiha pîvanên ku YPJ’ê xwe li ser mezin kiriye, pîvanên gelekî bi wate, mezin û girîngin ku ji kêliyên destpê me ev gotibû: Em ji bo Sûriyeke demokratîk nenavedî piralî têkoşîna xwe bidin meşandin. Em ji bo parastina mafê hemû jinan hene. Me bi beşek û netewekî ve sînordar nekir, me ev hemû tişt derbas kirin, ji ber ku doza jin doza herî sereke ku em têkoşîna xwe ji bo wê bidin meşandin. Ji bo em bighên azadiyê divê jin azad be. Li ser van xalan hîn bêtir pirsên şandeyan çê bûn.

Herwiha belkişandina herî sereke ew bû ku rola jin bi taybetî YPJ’ê di têkoşîna ku li hemberî zihiniyeta mêr-salarî, êrişên ji aliyê çeteyên dewleta Tirk û bi taybet ji milê çeteyên DAIŞ’ê ve li ser herêma me pêk hatin, YPJ’ê çawa karî têkoşîneke bê hempa bide meşadin. Di heman demê de nîqaş li ser vê bû ku bi pêşengtiya YPJ’ê destanên lehengî hatin çêkirin. YPJ’ê xwedî hizreke zelal û azad e xwe dispêre projeya netewa demokratîk, yekîtiya gelan, wekheviya di navbera herdû zayendan, azadiya jin û gelan, ji bo wê jî karîbû di Kobanê de guhertinekî mezin çê bike. Di Konbanê de YPJ’ê ji hemû gelan û mirovahiyê re da isbatkirin ku îro yê ji bo aştî, demokrasî û civakeke demoratîk pêşengtî bike, jin e. Jin dikare li hemberî şer û êrişan fikrekî zelal, cesaret û seknekî birûmet bide meşandin. Têkoşîna YPJ’ê ne tenê Kobanê parastin bû, lê di şexsê Kobanê de, mirovatî, hebûn û mafê jin parastin bû, ev jî bi zelalî bi saya YPJ’ê hat isbatkirin. Rûxmî derfet û teknîka kêm, lê cesaret û baweriya bi doza xwe YPJ’ê gelek guhertin û veguhertin pêk anîn. Di van hemû aliyan de meraqê şandeyan hebû, dîrokekî ku mirov sûd jê werbiger û di rêxistinbûyînê de xwe kurtir bike. Hem jî rola jin bi taybet YPJ’ê wê di pêşeroja Sûriyê de çawa be, ev xal jî gelekî girîng bû ku îro YPJ 12 sal ji têkoşîn û berxwedan li pey xwe hişt û kete 13 saliya xwe. Têkoşîna me jî ya azadiya gel û hemû jinan bû. Sînorê mêr-perestî, zayendperestî û olperestî derbas kir, lewma pêvajo wê qebûl neke ku cîhadîst perdeyên reş li ser vê têkoşînê berdin. Divê têkoşîneke ji bo Sûriyeke demokratîk, nenavendî û Sûriyeke ku jin di destûr de hebe û bi destê jin were nîvisandin, herwiha doza wê ya sereke be, hîn zêdetir bê meşandin. Ji ber zihniyeta ku li Şamê heye, zihniyeteke cîhadîste, jin qebûl nake. Em jî bi salan şerê me li hemberî vê hebû û ji îro pê de jî têkoşîna me ya mafedar wê hebe heya ku jin cihê layiqî xwe bigre. Bê parastin mirov nikare behsa azadiyê bike û ne bighêje demokrasiyê. Lewra em dibêjin wê jin xwe bi xwe biparêze. Jiyana bê têkoşîn mehkumî mirinê ye. Li ser van hemûyan bi rengekî zelal ji şandeyan re hate şîrovekirin.

**Armanca van serdanan çi ye û ji bo YPJ’ê tê çi wateyê? Herwiha nameya ku YPJ’ê dighîne jinan bi rêya van serdanan win çawa dikarin bînin ser ziman?**

Armancên wan ew bû ku ne tenê serdana YPJ’ê kirin, serdana gelek saziyên jin kirin, di nav de serdana YPJ’ê hebû. Serdana wan ji bû me ew bû ku van xalên ku me anîye ser ziman hîn bêtir naskirin, ji nêz ve pirskirin, şîrovekirin û her çiqas dengvedana YPJ’ê çêbûye jî, lê ji nêz ve hîn bêtir naskirin çêdibe. Herwiha YPJ’ê çawa heya îro xwe li ser lingan hiştiye û karî parastina hemû jinan bike. Ew parastina hemû jinan ne tenê Bakur û Rojhilatê Sûriyê, lê cîhanî bû. Ev armanc bû. Ji bo me jî her çiqas serdanê jinan çê bibe, cihê kefxweşiyê ye, herwiha girîng û biwate ye. Ji ber pêwîst e îro em tecrûbeyên xwe bi hev re parve bikin. Da ku ev tecrûbe di cihekî de sînordar nebe, rêxsitinbûyîn hîn bêtir xurtir bibe, bi hev re dengê xwe bilind bikin. Di heman demê de sîstemeke jinan li ser asta cîhanî ava bikin. Ev sîstem hemû jinan temsîl bike û sînorê ku sîstemên kapîtalîst avakiribûn derbas bikin. Lewma her çiqas serdan çê dibin ewqas em kêfxweş dibin ku ew şande tecrûbe û pêvajoyên me nas dikin, hem em jî têkoşîn û tecrûbeyên ku ew jî têre derbas bûne em jî nas dikin. Di heman demê de nameyên xwe bighînin hemû jinan. Dengê YPJ’ê çiqas gihiştibe cîhanê, lê bi rêya van şandeyan hîn bêtir rasterast mesacên xurtir bidin.

Herwiha mesacên bingehîn ji bo hemû jinan ew bû ku em xwe birêxistin bikin, xwedî îrade û fikir bin, yekîtiya me hebe. Ji bo azadiyeke mayînde hîn bêtir pêwendiyên me xurt bin ku em bi hev re ji bo cîhaneke azad, jina azad, civakeke demokrat xebatên xwe bidin meşandin. Tenê cihekî ku em bêjin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ev têkoşîn tê meşandin cihê dîtir neyên meşandin wê têkoşîna jinan qelis bimîne. Sîstemê ku îro bi her awayî dixwaze şoreşa JIN, JIYAN, AZADÎ berterf bike, li hember vê têkoşîna me binrxînin û istratîciyê meyze bikin. Ev mesac hatin dayîn. Şandeyên ku serdana YPJ’ê jî kirine, ev ji mere destnîşan kirin ku ew demên YPJ’ê dibînin, ji nêz ve dişopînin û nas dikin, bêtir dikarin wê heqîqeta heyî bighînin her kesî.

**YPJ’ê ji bo jinên têkoşer ên cîhanê tê çi wateyê?**

Hemû şandeyên serdana herêma me û bi taybet YPJ’ê kirin û ev dan xuyakirin ku YPJ’ê bû sîwaneke ku hemû jin xwe bispêrin wê. Ji ber pîvanên ku li ser wê rabûye, pîvanên xwezayî ne, di xwezaya jin de heye mîna dadmendî, demokrasî, azadî û wekhevîye. Ev hemû jî di xwezaya jin de hene. Lê YPJ’ê ev birêxistin kir, di warê zanebûnê de kurtir kir ku karî bibe hêza parastina hemû jinan. Hemû şandeyan jî ev diyar kir “Bi saya YPJ’ê îro em dikarin di cîhanê de behsa azadiyê bikin” herwiha şoreşa Jin, Jiyan, Azadî ku li tevahî cîhanê belav bûye, me jî weke YPJ’ê di konferansê xwe yê yekemîn de ev silogan anî ziman. Di vî alî de şandeyên ku hatin gelek minetdarî, hizikirin û kêfxweşiya xwe ji nêz ve anîn ziman ku hêza ku wan temsîl dike pê re di nav diyalogê de ne. Di nava YPJ’ê de jinên ereb, turkmen, kurd, entersyonel, suryan, asûr, ermen û hwd…hene ku ev rengbûna jinan di nava YPJ’ê de dide diyarkirin.



# Muzîk hêza cûda ya mirov e

Mirov di jiyana xwe de her tim bi muzîkê re têkiliyeke berdewam çêdike. Di dema tengasî û bêmoralîyê de muzîk xelasiya mirov e. Guhdarkirina muzîkê mirov bi tendurist û berhemdar dike. Muzîk, tenê ji dengan pêk nayê, lê deriyê ku cîhana hestên mirovan vedike.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Muzîk, dengê mirovan an jî dengê amûran bi formeke xweşik û hestyar anîna cem hevdu ye. Hunera vegotina hest û ramanê, bi şêweyekî yekdengî yan jî pirdengî ye. Di vê hunera vegotinê de newa, armonî, rîtm cihekî girîng digire. Di heman demê de muzîk, hunera newa, armonî û rîtmê ye. Bi qasî ku muzîk beşeke hunerî ye, beşeke zanistê ye jî.

Teoriyên destpêkê yên muzîkê Yewnaniyên Kevn pêş xistine. Di Yewnana Kevn de dans û muzîk cihek girîng digirt. Helbestvanan bi hevaltiya lîrê destan digotin. Pêyva muzîkê, di Yewnana Kevn de, ji navê Mousayan hatiye çêkirin. Mousayan xwedewandên îlhamê yên hunerê bûn. Di wê demê de pêyva “mousîka” têgeheke giştî bû ku ji bo her beşa huner an jî zanistê yên di bin xwedîkirina Mousayan de, dihat bikaranîn. Paşê ev têgeh tenê ji bo muzîkê hat bikaranîn.

**Muzîk gerdûnî ye**

Muzîk, gelek şêweyên newayên ji muzîka hêsan heya ya girîft di nava xwe de digire. Herwiha gelek tiştên mîrovatî û xwêzayî bi dest dixe. Bi çi şêweyê dibe bila bibe her muzîkek li gor xwe xwedî bandorekê ye. Di navbera şêweyên muzîkê de hilbijartin bi tevahiya xwe li ser zewq, hest û ramanan dimîne.

Li gor çand û ziman, erdnîgarî, nijad, ol û sosyolojiya mirovan, muzîk her ku diçe dibe xwediyê formên cuda. Her şêweya wê ya netewî, çandî û civakî heye. Ev yek nayê bisînorkirin. Lê belê ji ber ku muzîk di bingehê de ji dengan pêk tê, ji derveyê cêwaziya van rengan bi awayeke serbixwe tê pêhisîn. Di nava hemû huneran de muzîk hunera herî gerdûnî ye. Mirov ji zimanekî qet fêm neke jî dikarin ji newayêkê bandor bibe.

Bi taybet bi destpêka sedsala 20’an re wekî muzîka hemdem gelek şêweyên muzîkê pêş dikevin. Ji vî alî ve her ku diçe dewlemendiyeke mezin derdikeve holê. Ji ber wan rastiyan ango ji ber pêşketina muzîkên herêmî, xwecihî û civakî, hem jî şêweyên muzîkê, pênaseyekî hevpar ya muzîkê her ku diçe tengav dibe. Ji ber van sedeman li şûna pênaseyeke hevpar a muzîkê li gor çarçoveyên cuda civaknasî, derûnî, akûstîk, polîtîk û hwd… pênaseya muzîkê dikare were pêşxistin. Nêzîkatiya civaknasekî ji muzîkê re û ya fizîkgerekî ya ji bo akûstikê ji hev gelekî cuda ye. Ev nêzîkatî hemû ji aliyê muzîkperwer û zanistên muzîkê ve tên destgirtin û lêkolînkirin.

**Di jiyana mirovan de girîngiya muzîkê**

Tê zanîn ku têkiliya di nava mirovan de deng cihekê girîng digire. Ji ber vê jî bitaybetî di jiyana mirovan de rol û erkê muzîkê gelek girîng e yan jî bê wê nabe. Têkiliya mirov a bi muzîkê re berî zayînê dest pê dike heta dawiya jiyanê berdewam dike. Ji berî zayînê çend hefte pêçek di zikê diya xwe de li hemberî dengên muzîkal re hişyar e. Herwiha, di rojên destpêkê de ku em çavên xwe ji cîhanê re vedikin, bi lorîkên dayikên xwe re bêzanebûn bi muzîkê re em hev nas dikin. Piştre her strana ku em dibihîsin bêyî ku em wateya peyvên wê bizanibin dixwazin dubare bikin û newaya wê bigirin.



Bi lêdana beroşekê cara yekem em tama çêkirina muzîkê dijîn. Her ku muzîk tê naskirin, di vegotina muzîkê ya di aliyê hest, coş, kefxweşî, tirs û kederê de hêza muzîkê tê nasîn. Di heman demê de em fêr dibin ku lêdana amûrên weke piyano, flût, kemanê ligel qabiliyetê xebatek bi rêkûpêk dixwaze.

Ji ber wê jî mirov nikare muzîk û mirov ji hev cuda bike. Mirov di jiyana xwe de her tim bi muzîkê re têkiliyeke berdewamî çêdike. Mirov li mal, derve, cihê kar û cihên şahiyan bi muzîkê re dijîn. Ji ber wê em dibêjin: Jiyan bê muzîk nabe. Ango mirov bê muzîk nabe. Muzîk ji mirov re hêz û keyfxweşiya jiyanê dide qezenckirin. Jiyanê xweşiktir û zindîtir dike, bi dewlemendiya xwe reng dide jiyanê. Di dema tengasî û bêmoralî de muzîk ji bo mirov dibe hevalek herî nêzîk û hevkarê derketina ji tengasiyan. Guhdarkirina muzîkê, di jiyana rojane de, mirovan hîn zêdetir bi tendurist û berhemdar dike.

**Muzîk xwarina giyan ne**

Mirov di jiyana civakî de ji gelek çavkaniyan dengên muzîkê dibihîse. Ji radyo, tv, stranbêjeke li ser dikê, heta banga melayan, xwendina sirûdan û hwd… weke muzîk guhê mirovan tijî dike. Mirov bixwe jî gelek caran stranan dibêje yan jî hinek caran ji ber xwe jî peyvan bi şêweyê awazî pişt hevdu tîne. Yan jî bi amûrên muzîkê, muzîk çê dike. Tê zanîn ku mirov ne tenê di dema kêfxweşî de, lê di dema karkirinê de jî bi muzîkê re jiyan dike. Heta gelek caran jî gelek mirov bêmuzîk nikare bixebite û berhemekê biafirîne. Ji ber ku muzîk hêzeke cûda dide mirov. Muzîk giyanê mirov pêş dixe û dewlemend dike. Ji ber vê, gotineke navdar heye dibêje: ‘Muzîk xwarina giyan ne’. Çawa ku mirov ji bo pêşketin û mezinbûna di aliyê bedenî de pêdivî bi xwarinê heye, ji aliyê pêşketin û dewlemendbûna giyanî ve jî pêdivî bi muzîkê dibîne. Di jiyana mirovan de bi qasî pêşketina bedenî, pêşketina giyanî jî girîng e. Heta dikarin bêjin ku di wateyekê de, pêşketina giyanî ji pêşketina bedenî girîngtir e.

Li gor şaxên din ên hunerê, di nava muzîkê de, gelek şaxên din jî dikarin roleke mezin bilîzin. Muzîk, tenê ji dengan pêk nayê. Di heman demê de, gotin jî di nava berhemek muzîkal de xwedî rolêk sereke ye. Bi hêza gotinê, berhemek dikare xîtabê dil û mejiyê guhdarvanan bike. Bi hêza newayek, berhemek dikare xîtabî guhê guhdarvanan bike.

Lêkolînên di derbarê muzîkê de derdixin holê ku newa û rîtm, di mejiyê mirovan de yekser bandora xwe li ser beşên şabûnê, bêrîkirin û xemgîniyê dike. Ji ber vê jî muzîk, deriyê ku diçe cîhana hêstên mirovan vedike. Bi dîtin û bîhîstin dikare bikevê rihê mirovan û wan di nava dengan de bibe rêwîtiyekê.

**Di civak û civakbûyînê de rista muzîkê**

Di civakbûnê de muzîk risteke girîng dilîze. Yek ji wan hêmanên ku qelebelixa mirovan dike civak, muzîk e. Ev jî aliyê civakî ya muzîkê derdixe holê û ji derveyî kesan rola xwe ya civakî ya muzîkê jî diyar dike. Ji ber ku stran û sirûdên civakekê, mînak yên kurdan, mijarên cuda cuda bi dest digire. Hinek bi mirov, hinek bi jiyanê û hinek jî bi xwezayê ve girêdayî ne. Ji ber vê berê mirovan didin başî, xweşikbûn û rastiyê. Li ser vê bingehê muzîk, ji bo civakê kevneşopî, exlaq û pîvanên hevpar derdixe holê. Di heman demê de dibe alîkar ku civak li derdora van kom bibe.

Di aliyê civakî de erkên pir berfireh û di nav hev de yên muzîkê hene. Li gel perwerde, şahî, coşîn û bêhnvedana mirov, çanda civakekê ji nivşekî ber bi nivşekî din tê ragihandin. Herwiha muzîk amûrekî bi bandor a perwerdê ye. Guhdarkirina muzîkê, mirov ji aliyê civakbûyinê ve pêş dixe û ji aliyê hestyarî ve jî bihêz dike. Tê zanîn ku civakbûn jî hevgirtina hestên pêşketî ye. Kesê ji muzîkê bandor dibe, hinek taybetmendiyên weke guhdarkirina muzîkê, bi muzîkê lîstin, stran gotin û lêdana amûrê muzîkê qezenc dike. Ev jî, him ji aliyê civakbûnê him ji aliyê xizmeta civakê ve pêwîst e.

# ‘Çand û hunera me nasnameya me ye’

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Mustefa û Ehmed Wehab 2 birayên ku nabîn in û ji bajarê Kobanê ne, ji sala 2015`an ve karê çand û hunerê dikin tevî astengiyan, xwe di muzîk û stranan de pêş xistine.**



Mustefa û Ehmed Wehab 2 birayên nabîn in, tevî astengiyên xwe ku bi herdû çavên xwe nabînin, nebû kelem li paş tilî û dengên wan, ew bi vîn û hezkirina xwe ji jiyanê re, rêyên derbasbûna dîrokê ji bo xwe vedike. Her wiha xwe di muzîk û stranan de pêş xistine û niha jî cihê xwe di nava komên Çand û Hunerê ya bajarê Kobanê de cihê xwe digre. Ev nêzî 10 sal in ku dest bi karê hunerê kirine. Bê guman Mustefa û Ehmed di nava malbatekî hunerî de mezin bûne û ev yek bû sedem ku xwe di nava hunera kurdî de pêşbêxin û pêşketinê pêkbînin.

Di derbarê hezkirin û girîngiya hunerê di nava civakê de, Mustefa û Ehmed Wehab ji Rojnameya ma re axivîn.

Mustefa Wehab di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Temenê min 30 sal e, ez ji gundê Şêranê yê girêdayê bajarê Kobanê ye. Belê min gavên xwe yên yekemîn bi birayê xwe re yê ku ew jî astengdarê çavan e, avêt û me bi temenekî biçûk kilam bi hev re digotin, me sebra xwe bê ronahiya çavan bi stranan tanî.

Mistefa û hevalên xwe hêvî dikin ku ji bo wan girîngiyeke zêde were dayîn û alîkariya wan di warê gotin û awazan de ji bo stranan were kirin, herwiha koma wan mezin bibe û li ser asta Kurdistanê navdar bibin. Ew di zarokatiyê xwe de dengê hunermendên Kurd dibihîztin û bala wan diçû ser muzîkê.

**‘Me tu astengî li pêşiya xwe ne dît’**

Mustefa di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Ji ber ku çavên me nabîne, bala me timî diçe ser deng. Me nedidît, lê me dibihîst. Hezkirina me ji muzîk û stranan re pir hebû, ji ber ku malbata me malbatekî hunerî ye, ev bû sedem ku em tu astengiyan li pêşiya xwe nebînin. Îro em hewl didin ku bi riya deng û muzîkên xwe êşa û buyerên di bajarê me de diqewimin, em derxînin. Di dawiyê de ez dixwazim bêjim ku bila tu kes astengiyan li pêşiya xwe nebîne, îro derfetên mezin li pêşiya me vebûne ku em bi riya çand û hunera xwe êş û çanda xwe ji cîhanê re bidin nasîn.”

**‘Çand û hunera me nasnameya me ye’**

Di heman demî de Ehmed Wehab diyar kir ku ji bo karibe dengê xwe bi rengekî rast û berhemdar bi kar bîne tevlî Çand û Hunera bajarê Kobanê bû û wiha got: “Temenê min 27 salî ye, ez jî wekî birayê xwe ji zaroktiya xwe de min dest bi hunerê kir, min her hez dikir li amûrên muzîkê bixim û kilaman bêjim, bê guman bi piştgiriya malbata xwe têkilî û hezkirina min ya ji bo muzîkê zêde bû. Dema ku destpêkê derketim ser dikê bi coş û kelecaneke mezin bûm, bi fikar bûm gelo karim bikim yan na. Bi rengekî serketî min qedand, êdî ew bawerî li cem min mezin bû. min riya hunerê ji xwe re kir armanc, ji ber ku çand û hunera me nasnameya me ye û pêwîsta em xwedî li nasnameya xwe derkevin.”

**‘Ne dîtina çavan, wê tiştek nebe asteng’**

Ehmed di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Nedîtin bandorê li jiyana me nake. Em bi çavên ji dil, bi hestên xwe jiyana xwe dewam dikin. Dibe ku em nabînin, lê belê em bi hestên xwe tevdigerin. Em ronahiyê nabînin, di nava tarîtiyê de dijîn, lê belê hildiberînin. Nabînin lê belê tevkariyê li hunerê dikin. Ji xizmeta ji gelê xwe re tiştekî din nîne ku em pê serbilind bibin û me kêfxweş bike. Tevlîbûna li nava karên çand û hunerê ji bo me têrê dike. Bi piştevaniya bi civakê re em tevkariyê li hev dikin. Belê bala min li ser amûrên muzîkê hemûyan e. Dixwazim bi hemû amurên muzîkê re mijûl bibim, bibim pispor.”

# Roja Rojnamegeriya Kurdî

Di 22’ê Nîsana 1898’an de, yekem rojnameya Kurdî ji aliyê Miqdad Bedirxan ve li paytexta Misirê Qahîrayê hat derxistin. Ji ber ev rojnameya yekemîn di dîroka çapemeniya Kurdî de bû, roja derketina wê weke Roja Rojnamegeriya Kurdî hat ragihandin û tê pîrozkirin.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Weke tê zanîn destpêka rojnamevaniya kurdî bi rojnameya Kurdistan ku di sala 1898’an de derketiye û dest pê dike, herwiha ev rojname 22`Nîsanê de dest bi weşanê kiriye. 22 Nîsanê de lewma salvegera rojnamegeriya kurdî li her çar parçeyê Hurdistanê tê pîrozkirin. Ev rojname di sirgunê de derketiye holê. Rojnameya kurdî ji aliyê Mîqdad Bedirxan ve li Qahîrayê payîtexta Misirê hate derxistin. Di dîrokê de gelek tişt ji aliyê malbata Bedirxaniyan ve hatine raxistin, Rojnameya Kurdî jî wisa bû. Di heman demê de piştî Miqdad Bedirxan birayê wî Ebdurheman Bedirxan dest bi weşanê kir. Bi îfadeyeke din derketina rojnameyên Kurdî, destpêka qonaxa hişyarbûn û têkoşîna xwe avakirina millî ya modern a gelê Kurd e. Bi derketina rojnameyên Kurdî re bîr û bawerî, zanîn û çanda rewşenbîrî ya nûjen a li ser bingeha neteweyî ya modern dest pê kir. Rojnameya Kurdistanê di ronakbûna Kurdan a di sedsala 21’an de bûye ronahiyek û ji bo sazîbûna modern a çapemeniya Kurdî roleke giring bi cî aniye. Lewma roja derxistina rojnameyê yanê 22yê Nîsanê ji sala 1973yan û vir ve wek Roja Rojnamegeriya Kurdî tê qebûlkirin û pîrozkirin. 127 sal in bi hezaran rojnamegerên Kurdî digel hemû êriş û astengiyan, digel polîtîkayên înkar û tunekirinê li ser rêya ku Mîqdat Mîdhed Bedirxan vekiriye bi biryardarî dimeşin û vê kevneşopiyê bênavber hildigirin. Bi vê taybetmendiya xwe Rojnameya Kurdistanê li Rojhilata Navîn ji rojnameyekê wêdetir li dijî înkar û tunekirinê bûye roniya heqîqetê. Lewma dîroka çapemeniya Kurdî wek qadeke têkoşîn û berxwedanê xwe peytandiye û piştî evqas salan digel hemû zext û zordariyan jî têkoşîna xwe ya ronakbîriyê domandiye û xurt kiriye.




**Dîroka Rojnamegeriya kurdî**

Roja Rojnemgeriya Kurdî her sal bi minasebeta 1’emîn rojnameya bi Kurdî ‘Rojnameya Kurdistan’ ku li Misrê û li bajarê Qahîreyê hat çapkirin, di 22`ê Nîsanê de tê pîroz kirin. Piştî Rojnameya Kurdistan, gelek Kovar û rojnameyên weke Jiyan, Hawar, Jîn, Ronahî, Gelawêj û gelekên din li ser rêka Kurdistan hatin weşandin. Di heman demê de Rojnameya Kurdistan bû bingeh ku rojnamegeriya Kurdî bighêjîne roja îro. Piştire jî ji ber êrîşên ku rojname pêre rûbirû dima cihê wê hat guhertin û li Cenevreya Swîsreyê,herwiha ji ber heman sedemê dîsa li Qahîreyê, Ingîlîstan û çapa herî dawî hemjara 31`an di sala 1902`an de li Sîwisreyê hat çapekirin. Ya herî bi naverok jî ev roj ji sala 1967 an ve wekî destpêka rojnemegeriya Kurdî hatiye qebûlkirin û her wiha bi vî awayî jî tê pîrozkirin. Hejmarên 1 heta 5’an li Qahîreyê, ji 6 heta 9’an li bajarê Cinêv a Swîsreyê, ji 20 heta 23’an li Qahîreyê, hejmara 24’an li Londonê, ji 25 heta 29’an li başûrê Îngilistanê û hejmarên 30 û 31’ê dîsa li Cinêvê hatiye çapkirin û weşandin..Piştî Mîdhed Bedirxan Beg, Ebdulrehman Bedirxan Beg xwe da bin barê derxistina rojnameyê, di 47 meh û 22 rojan de, li sirgûnê di rewşeke dijwar de 31 hejmar hatine weşandin. Di 13’ê Nîsana 1909’an de rojnameya “Kurdistan”ê ji aliyê dewleta Osmaniyan ve hate girtin. Rojnameya Kurdistanê li serhev 31 hejmar derket. Miqdat Midhet Bedirxan 5 hejmarên pêşîn derxist, lê ji ber zordestiya dewleta Osmanî Miqdat Midhet Bedirxan nema karibû derxista, loma birayê wî Ebdurrehman Bedirxan dest bi derxistina rojnameya Kurdistanê kir. Ebdurrehman Bedirxan jî ji ber zilma dewleta Osmanî, piştî Qahîreyê, li Swîsre û Îngilîstanê dest bi derxistina rojnameya Kurdistanê kir.
Bê guman ev çapemenî pêşket bi têkoşîna Kurdan re, bi derketina Tevgera Azadiya Kurdistan re ragihandina azad hat damezirandin û yekemîn car bal kişand li ser doza Kurdan, rewşa Kurdistanê û siyaseta ku li ser tê meşandin, ji aliyê sîstemên desthilatdar ve, ev yek jî pêşket bi fedekariya rojnamevanên şoreşger ên ku li ser şopa rastiyê canê xwe feda kirin mîna Sakîne Cansiz, Mezlûm Dogan, Gurbetlî Ersoz û Xelîl Dag. Ev yek jî guhertin û veguhertinên mezin bi xwe re anî, ji ber qedxekirina ragihandinê li ser gelê Kurd ku nikaribin bi çanda xwe bijîn û doza mafên xwe bikin, lê bi têkoşîna ragihandina azad re, civaka Kurdistanî ber bi azadiyê ve çû û xwe ji zihniyeta desthilatar rizgar dike. Rojnamegeriya Kurdî bi nivîsê dest pê kir, lê di roja îro de bi hezaran beşên wê û rojnameger di nav de dixebitin hene. Di sedsala 21`emîn de ragihandin bûye amûra yekemîn a şer, her hêzek li gorî hişmendiya xwe bi kar tîne û civakê di bin bandora xwe de dihêle. Gelê Kurd jî her dem bi qirkirinê re rû bi rû maye, lê ji bo ku ev gel li rastiya xwe venegere bi sedan televîzyon, ajans, radyo û rojname hatine girtin ango qedexekirin. lewre di weşanan de ev yek bingeh girt.

**Nêrînek giştî girêdayî medya û medyaya kurdî**

Çapemenî di roja îro de wek “Hêza Çaremîn” tê bi nav kirin. Dibe ku di dahatû de bibe hêza yekemîn. Rojnamegerî bi giştî medya hewcedarîyeke xwezayî ye. Bandora mezin a medyayê ji ser modernîzim, postmodernîzm, ol, guherîna civakî, têgihiştina hêz û desthilatdarîyê, pêşketinên idolojîk, pêşketina teknolojîkzanistê heta beralî kirina civakê, pêkanîna guherînên bingehîn û gewre, veşartina karên qirêj a deshilatdariyê, pergala aborî û hwd. De heye. Em dikarin gelek xalên bipeywendî zêde bikin. Her xal hêjayê nirxandinêye, lê ev tişt encax di pirtûkekî lêkolînî de dikare pêk be. Lê ev rewş bo kurdan hinek diguhere. Ji ber ku dewletekî navendî ya Gelê kurd tuneye. Ji ber vê him şêweya rojnamegeriyê di nav gelê kurd de cewaze him jî sedema bikaranîna media cûdaye. Piştî peymana Lozanê welatê kurdan bû çar perçe. Di her parçeyê de dewleta ku vê parçeya xakê kurdan dagir kiriye, bi şêwazên cuda hemberî hebûna kurdan derketiye. Ji ber vê yekê jî di her parçeyekî de rewşa gelê kurd jî ji parçeyeke din cewaztir bûye. Hêmanên ku ji bona medyaya cihanê dabaşa gotinê ye, di medyaya kurdî de hêmanên wekî standartize kirin û pêşxistina zimanê kurdî, hewla rizgarkirina xaka Kurdistan, dîplomasî, pêşxistina muzîk û bi giştî çanda kurdî, pêk anîna hîşa neteweyî ya kurdî, modernîze kirina civaka kurdî, pêk anîna hişmendiya dîrokî ya kurdî jî zêde dibin. Her wiha partiyên Kurdistanê dezgehên xwe yên çapamenî ji bo propagandaya rexistinê xwe jî bi kar tînin. Ev yek li ber medyaya kurdî de astengiyek din e ku divê were bihartin. Rojnamegeriya kurdî jî ji dema zayîna xwe ve bi dijwarî, êş, asteng û qedexeyên bi curbecur re rûbirû maye. Rêwîtiya ku em îro di navdene ne tenê rêwîtiya çapemeniya kurdî an jî mediyaya kurdî ye, her wiha rêwingiya bibiryar, dijwarî û serkeftinê ye.

# Xwarinên dapîran bi destên neviyan

**Dilovan kêfo/Amûdê**

**Xwarin beşeke bingehîn a Filiklora çandî ya her civakekê ye, adet û kevneşopiyên gelan nîşan dide. Komeke jinên bajarê Amûdê ji bo pêşxistina aboriya xwe xwarinên gelerî amade dikin.**

Li bajarê Amûdê komek jin bi rêya çêkirina xwarinê debara xwe dikin û çanda xwarinê gelerî diparêzin. Derbarê mijarê de du jinên ku endama koma jinênê ku xwarinên gelerî amade dikin ji rojnameya me re axivî. Jina bi navê Nûra Hesen di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Em weke komek ji jinên bajarê Amûdê, ji bo pêşxistina aboriya xwe me dest bi karê amadekirina xwarinên gelerî kir. Em xwarinên bi taybet bi herêma xwe amade dikin. Em dixwazin xwarinên xwe yên gelerî bi tevahiya herêmê û cîhanê bidin nasîn.”
Nûra Hesen da zanîn ku koma wan ji 5 jinan pêk tê, her jinek bi erkekî radibe û wiha domand: “Koma me ji 5 jinan pêk tê, jinek di warê medya civakî de de kar dike, ya din jî pêşwazkirina daxwazên kesên ku xwarinê dixwazin dike û sê jinên din jî xwarinê amede dikin. Em hewil didin ku kesên xwarina me dibin, kefxweş û razî bin. Zehmetiyên ku derdikevin pêşberî me, derfetên me yên kêm û biçûkbûna cihê ku em xwarinê lê amade dikin.”
Nûra Hesen axaftina xwe wiha qedand: “Ya herî girîng ew e ku em çawa karibin hevsengiyê bixin navbera karê xwe û mala xwe de. Ji ber vê yekê em êvarî hemû karên xwe dikin û piştî wê jî em karên xwe yên hevbeş jî dikin. Hêviya min ew e ku karê me mezin bibe û piştgirî ji bo me bê pêşkêşkirin. Banga min ji bo her jinekê, pêwîst e jinkar bike û her tim di asta pêşengtiyê de cihê xwe bigre.
Jina bi navê Cîhan Hesen jî behsa çêkirina xwarinê kir û wiha got: “Ji demeke dirêj ve min dixwest dest bi pirojeya amadekirina xwarinên gelerî bikim. Ji ber ku ez pir ji vî karî hez dikim. Piştî min derfet dît, min bi hevalên xwe re ev piroje dest pê kir. Em hemû xwarinên gelerî mîna serûpê, şamborek, Kutilk û hwd çêdikin. Ez bi hêvî me ku karê me berfirehtir bibe û her jinek ku ji vî karî hez dike tevlî me bibe.”





# Platforma Yekîtiya Jin ji bo avakirina modêla demokratîk e

Berdevka Kongra Star Rîhan Loqo diyar kir ku 24 rêxistinên jinan û partiyên siyasî yên ji çar parçeyên Kurdistanê li Silêmaniyê beşdarî platformê bûn û got,“Ji bo têkoşîna hevpar, Platforma Yekîtiya Jinên Kurd li ser bingeha xebatên zanistî, siyasî, hunerî û rewşenbîrî di hemû aliyan de bi hev re ji bo avakirina modêleke demokratîk kar û xebat tê kirin.”

**Tekoşîn Amara/ Qamişlo**

Derbarê girîngiya Platforma Jin û xebatên jin Berdevka Kongra Star a Rîhan Loqo ji Rojnameya me re axivî.

**‘Desthilat rol nadin jinê ku di dîzayina Rojhilata Navîn de cîh bigre’**

Rîhan Loqo bal kişand ser tekoşîna ku jinên Kurd li seranserê cîhanê didin meşandin û wiha domand: “Jinên kurd ji bo parastina maf, nasname, hebûn û dîroka xwe, xweparastin di tevahiya qadên jiyanê de bi awayekî felsefî û zanistî esas girtin. Bi destpêkirina şerê cîhanê yê yekemîn û duyemîn û bi dêrêjahiya dîrokê heta niha, êrişên li dijî jinan zêde bûn, wekî ku Rêber Apo jî dinirxîne; di şerê cîhanê sêyemîn de qirîz û pevçûnê heyî, taybet şer, lêdan, komkujî, revandin û destdirêjiyên li ser jinan û bi hezaran bûyerên ku li ser jinan tê meşandin derketin holê. Di şerê cîhanê yekemîn û duyemîn de parastina maf û hebûna jinê maf û hebûna jinê zêde derneket pêş, ji bo wî jî di şerê cîhanê sêyemîn de hemanê heyî şerê li ser nasname, hebûn û destkeftiyên jinê ye. Desthilat naxwazin ku jin di dîzayîna nû a Rojhilata Navîn de cih bigrin. Di nav guhertin û veguhertinan de li seranserî Kurdistanê bi pêşentiya jina kurd di tevahî qadên jiyanê de jin ji bo komfederalîzma demokratîk tevahî îmkanên xwe xistiye dewrê da ku sîstemek edalet û wekhevî ava bike.”

**‘Mafê jinan bê parastin ‘**

Rîhan Loqo di derbarê girîngiya şoreşa Rojava û Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de wiha got: “Piştê şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Rojava, jin roj bi roj destkeftiyên nû ava dikin, sîstemekî ku ji civak, gelan û ji pekhateyan re deriyê demokrasiyê li civakê vedike. Sîstema ku jin ava dike wate û bandorekî xwe yê mezin heye. Li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê rexistin û tevgerên jinan bi hilweşandina Rejîma Baasê re derbasî qonaxeke nû bûn. Di Sûriya nû de û di destûra Sûriya nû de ji bo ku wek jin çawa tekoşîna jin a hevpar bidin meşandin, rêxistin û tevgerên jinan, sazî û kesayetên jin, rewşenbîr û nivîskarên jin yên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê gelek şêwrên jinan, komxebat, konferans û komcivîn hatin li darxistin. Wek jinên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê û giştî Sûriyê, Sûriyekî çawa dixwazin, ev jî bi rêya komxebat û civînan me helwesta xwe ji raya giştî re parve kir. Sûriyekî ne navendî pirrengî, pirçandî û pirzimanî dixwazin. Di Sûriya nû de divê ku jin di komîteya nû a destûrî de ne wek şekil bigre, divê ji bo hebûna jin û mîsogerkirina mafê jinan û hebûn û parastina destekftiyên şoreşa jin, jin cihê xwe bigre.”



**‘Doza azadiya jin esase’**

Rîhan Loqo wiha domand: “Jin hem ji bo doza gelê kurd hem jî, herwiha ji bo doza azadî û nasnameya xwe tekoşînekê hevpar dimeşîne. Piştî ku Rêber Apo banga dîrokî a Aşitî û civaka demokratîk kir, Rojhilata navîn û cîhan derbasî qonaxekê nû bû, ne tenê Sûriye bi giştî cîhan derbasê merheleyekî nû bû, di vî merhelê de jin jî cîhê girt. Piştê banga dîrokî gelek guhertinên mezin ji aliyê jinan ve hatin kirin. Bandora banga Rêber Apo li ser jinan gelek diyarker e, ji bo wî jî me dît ku Rêber Apo ji zimanê şer û lêdanê zêdetir zimanê çareserî û diyalogê esas digre, em wek jin pêwîste divî sedsalê de zêdetir bi zimanê diyalogê mafê xwe biparêzin. Heman deme de li Rojava jî pêwîstî hat dîtin ku wek jinên kurd komîteya beşa Rojava ê jin û beşe netewî yên Kurdistanê di wan demên dîrokî de wek jin bi belgeyekî, siyaset û planê heyî û pêşketinên ku bi pêşengtiya jin ji dîrokê heta roja me ya îro ku li ser hindek pirensîban li hevdû bikin.”



**‘HTŞ’e bi paçê reş qanûn û qûralan li ser jinê derdixe’**

Rîhan Loqo balkişand ser siyaseta HTŞ’ê ku rojane biryarên nû li ser jinê derdixe û wiha dirêjahî da axaftina xwe” :Di demeke ku şer û pevçûn li ser hebûn û nasnameya jin dihatin maşandin, desthilata Şamê HTŞ’ê rojane bi paçên Reş dixwast qanûn û biryarên nû li ser jin derxe û hebûna jin ji holê rake. Li milekî de li ser bendeva Tişrînê şerekî dijwar dihat meşandin, li milê din jî erîş li ser hebûn, nasname û destkeftiyên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê dihatin kirin. Di pêvajoyekî ku ji hemû aliyan ve êrîşên dijwar li ser Bakûr û Rojhilatê Sûriyê dihatin meşandin de, konferansa jin a netewî bi beşdarbûna 300 jin hat li darxistin ku em wek jinê kurd û netewî helwest û nêrînên xwe bikin yek ku ji raya giştî û cîhanê re parve bikin. Hedefa me yekemîn ji vê konferansa yekîtiya jin ew bû ku di demên pêş de konferansa netewî a kurd ku li Rojava çêbibe ku helwestên me jinan yek be ku bibe wesileya ku em yek helwestê pêşengtî ji xebatên giştî re bikin.”

**‘Bi yekîtiya jinan wê planên qirkirinê têk biçe’**

Rîhan Loqo di dewamiya axaftina xwe de wiha got: “Piştê Konferansa Jin me weke komîteya amadekar a kongra netewî a jin di Kurdistanê de pêwîstî hat dîtin ku bicivin, di platforma jin a ku li Sûleymaniyê çêbû rewşa Rêber Apo, guhertin û veguhertinn ku hatine çêkirin hatin nîqaşkirin. Taybet rewşa jin di Kurdistanê û di dîzayînkirina Rojhilata Navîn de, em ê çawa bi pêşengtiya jina kurd pilanê qirkirinê yên ku dixwazin li ser jinê pêk bînin, hebûn û hêza jin têk bibin hatin nîqaşkirin. Heman demê de erîşên li ser tevgera jin, jinên ku bi her cûre tundiyê re rû bi rû dimînin û qetlîamên ku li ser gelê elewî tên kirin hatin şermezarkirin. Û wek jin li hemberê xeteriya xwe çawa biparêzin hatin nîqaşkirin.”

**‘Li çar parçê Kurdistanê jin xebatên hevpar bidin meşandin’**

Rîhan Loqo behsa girîngiya platforma yekîtiya jin kir û axaftina xwe wiha qedand: “Wek jin me pêwîstî dît ku platformekî hevpar a jinan bê avakirin ku hên bêtir xebatên jinê kurd û yên netewî di asta kurdistanê de bi hevdûre bidin meşandin. bi rêya platforma netewî a kurd de 24 rêxistinên jin yên Kurdistanê ji bo xebatên zanistî, siyasî, hunerî û rewşenbîrî çandî bi hemû aliyan de xebatên hevpar bi hevdû re bidin meşandin. Em bikaribin ku salê carek festîvala kurd û Kurdistanî a jin û rewşenbîrtiya jinê kurd li Kurdistanê lidar bixin ku ji her welatek rewşenbîr kom bibin. Dengê hunere û dengê jin hewil bidin bi rêya nivîsa, stran û dengbêjiyê bikaribin parvekirina herêman bidin çêkirin, bi hevdûra bi yek deste li hemberê sîstema qirkirinê bisekinin. Di demên pêş de wek jinên kurd û kurdîstanî bi hevdûra bidin meşandin. Şaredariyên ku bi pêşengtiya jinan li Bakûr tê meşandin çawa tekîliyek û rihekî hevpar di navbera Bakûr û Rojava de çêbikin. Bi vî awayê sîstema jin hên zêde xort bikin û bikin modela demokratîk li Kurdistanê û Rojhilata Navîn de.”

# Operasyona li Kampa Holê di roja duyem de didome

**Navenda Nûçeyan**

**Operasyona ewlehiyê ya li Kampa Holê di roja duyemîn de li beşên jinên DAIŞ’î û penaberên Iraqî dewam dike.**

Operasyona ewlehiyê ku duh ji aliyê Hêzên Ewlekariya Hundirîn ve hatibû destpêkirin, di roja duyemîn de ye. Operasyon bi desteka YPJ’ê û QSD’ê ji bo paqijkirina Kampa Holê û derdora wê ji şaneyên DAIŞ’ê dest pê kiriye û li beşên jinên DAIŞ’î û penaberên ji Iraqê berdewam dike.
Hêzên operasyonê ji saetên sibehê ve dest bi operasyona lêgerînê li beşên jinên DAIŞ’î û penaberên iraqî yên kampê kiriye. Operasyon li her du beşan dewam dike.
Hêzên Ewlekriya Hundirîn duh (19 Nîsan) bi daxuyaniyekê operasyona li dijî şaneyên DAIŞ’ê ya li Kampa Holê dabû destpêkirin. Di daxuyaniyê de hatibû gotin: “Di van demên dawî de, li kampê hewldanên dubare yên şaneyên DAIŞ’ê ji bo revandina malbatan çêbûn. Her wiha bi dehan rewşên gef û lêdanan li dijî şêniyên kampê hatin dîtin.”
Li Kampa Holê ku 45 km li rojhilatê bajarê Hesekê ye, 35 hezar û 323 kes hene, ji wan 13 hezar û 124 kes penaberên Iraqî ne, 15 hezar û 805 koçberên Sûriyeyî ne, 6 hezar û 385 jin û zarokên DAIŞ’iyan in.



# Xerîb Hiso: Bê yekîtiya kurdan pirsgirêka kurd çareser nabe

**Hevserokê PYD'ê Xerîb Hiso diyar kir ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê zedetirî 10 salan e ku li ser bingeha Netewya Demokratîk têkoşîn û xebat tê meşandin û wiha got: "Hemû çand û ol li gor pîvanên exlaqî yên civakê bi hev re jiyan dikin û ev jî ji bo Sûriyê giştî dibe ezmûn."**

**Amara Baran/ Qamişlo**

Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk Xerîb Hiso di derbarê girîngiya pergala Netawe demokratîk û kongra netewî ya kurd de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji Rojnameya me re axivî.

**'HTŞ'e tevgerekî bê proje ye'**

Xerîb Hiso diyar kir ku li Suriye piştî hilweşandina Rejîma Baas hatina HTŞ'ê di Sûriyê de rewşeke nû bixwe re anî û wiha got: "Hatina Colanî li ser desthilatdariyê her kes matmayî hişt, ji ber ku ew di bingeha xwe de cîhadîst û selefîne û ew tevgereke bê proje ye, li cem wan projeyekî ku bikaribin Sûriyê birêva bibin nîne, tênê projeya di destê wan de çawa bikaribin cîhadbûnê û selefîbûnê xort bikin û çawa Sûriyê bikin navendekî cîhanî ji cîhadistan re û di Rojhilata Navîn de hemû selefiyan komî cem xwe bike. Ew jî ji bo gelan dibe cîhê metirsiyekî mezin. Ger Sûriyê bi wî rengê biçe wê felaketên mezin û neheqiyên pir mezin li ser gelan pêk were. Di Rojhilata Navîn de gelek pirsgirêk hene, di wan welatan de desthilatdarên heyî di aliyê hişmendî de desthilatdarên lê bê projene, projeyekî li ser bingeha civaka exlaqî û demokratîk û ji bo çareserkirina hindurîn tune ye, ji ber wê jî pirsgirêk gelek kûr dibin û bixwe re pevçûnên mezin tîne."

**'Rêveberiya Xweser hemû pêkhateyên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê hembêz dike'**

Xerîb Hiso balkişand ser girîngiya demokrasiyê û wiha domand: "Di roja me ya îro de Sûriyê, Libnan, Iraq, Îran, Tirkiyê û hemû welatên Rojhilata Navîn muhtacê demokrasiyê ne. Demokrasiya heyî ne bi şêwazê kevin ku desthilatdar pê diaxivin, şewazê ku civak pê tê qebûlkirin, bi hêz û fikra civakê hemû beşên di nava civakê de hembêz dike û çareseriyeke bi edalet û wekhevî pêk tîne. Di Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de Rêveberiya Xweser di çarçoveya netewa demokratîk de hemû gelan hembêz dike û li ser esasê projeya netewa demokratîk xebatê dimeşîne û hewil dide hemû pirsgirêkên heyî çareser dike. Zêdetirê 10 sal in ku tekoşîn û xebat li ser projeya netewa demokratîk tê kirin. Li ser esasê netewa demokratîk li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê hevpeymanên civakî hatine îmzekirin. Hemû çand û ol li gor pîvanên exlaqî civakî dinav hev de jiyan dikin ji bo Sûriyê giştî dibe ezmûn. Îtîfaqa ku li Şamê di navbera Mazlûm Ebdî û Ehmed El- Şerea hatî çêkirin de encama projeya netewa demokratîke de ye, yekem care ku kesayetên selefi û cîhadî bi awayek demokrat Peyman îmze dikin û îttîfaqeke wiha çêdibe. Ji bo wê jî projeya netewa demokratîk hêdî hêdî xwe rawa dike, civak û pêkhateyên ku li Sûriyê jiyan dikin rastiya xwe di projeya netewa demokratîk de dibînin. Ger ev proje li hemû Sûriyê bê meşandin em dikarin wê demê bejin ku ev proje a hemû Sûriyê ye."

**'Li Sûriyê gelê kurd di pêvajoyekê nû de derbas dibe'**

Xerîb Hiso bal kişand ser Kongra Netewî a Kurdî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û wiha got: "Di vê pêvajoya nû de gelek tişt hatin guhertin û tiştek bi navê siyaseta nû nema tê kirin, bi taybet di Sûriyê de û ji bo kurdan jî pêvajoya ku nû rû daye bandora xwe li her tiştî dike, taybet bandorê li vîna me kurdan dike. Hewildan heye ku di rojên pêşiya me de em di kongreyekî de bên cem hev, ne tenê partiyên siyasî, beşên ji civakê û rewşenbîr û hiqûqnas, jin, û ciwan jî wê beşdar bibin. Reşnivîs ji aliyê hemû kesan ve hatiye nivîsandin PYNK-S, ENKS û partiyan hemû nêrîna xwe li ser reşnivîsê daye û bi erînî jî hatiye dîtin. Roja Kongrê wê reşnivîs ji hemû beşdaran re bê xwendin û li gor wî guhertin û vegûhertin bên çêkirin. Piştî ku belge bê erêkirin wê komîte bê avakirin û li ser wî esasê komîte bi belgeyekê biçe Şamê. Heta ku îtîfaq pêk were piştgiriyek xort lazime."

**'Gelê kurd xwedî mafe'**

Xerîb Hiso di dewama axaftina xwe de wiha got: "Li tevahî cîhanê guhertinên mezin pêk tên, ji me kurdan jî tê xwestin ku demokrasiya netewî û yekrêziya kurdî pêş bixin, em çiqas pîvanên demokrasiyê di nav xwe de pêş bixin ewqas destkeftiyên me têne parastin û di heremê û di cîhanê de dibin xwedî rol. Hêza



civakê di aliyê fikrî û îrade da û di pîvanê wî de pêşketinên pir mezin çêdibin. Ji ber ku siyaseta me siyasetekî civakî û exlaqî ye, gelê kurd jî vî siyasetê pêk tînin û li ser vî esasê rêxistin dikin û bi vî awayê pîvanên demokrasiyê pêk tînin. Li ser vî esasê ji bo rastiya azadiya xwe tekoşîn û berdelên giran didin. Civaka kurd pêşketina ku di nav xwe de daye çêkirin îro pêşengtiya şoreşa însanî û şoreşa demokratîk dike, lewma gelê kurd ji guhertinê re amade ye, ji ber ku civakek rêxistin kiriye û xwedî fikire, ku gelê kurd van merheleyan hemûyan pêk aniye."

**'Di vê pêvajoyê de pêwîst e gavên ji dil bên avêtin'**

Hevserokê PYD'ê Xerîb Hiso axaftina xe wiha qedand: "Gelê kurd di çarçoveya pîvanên exlaqî û çandî de û di pîvanê şerê gelê şoreşgerî de xwe bihêz kiriye lewma di guhertinan de zû gav tên avêtin, di berxwedan û helwestê xwe de xwedî sekneke mezin û xortin. ji bo me xebatên dîplomasî girînge di tekîliyên derva de xebatên derve de dîplomasî xwedî roleke girînge wan gavan hatine avêtin û hên jî tên avêtin. Tekîldarê rewşa kurdan û tekîldarê rewşa Sûriyê de, di asta cîhanê de dewletên mezinin dibînin ku gelê kurd aliyek xwe çêbûye û xwedî mafe, ji bo wî jî divî pêvajoyê de zêdetir gavên samîmî bên avêtin ji bo ku demokrasiya xwe xort bikin û tekîliyê hundir de zêdetir xort bibe dayîn û standin ne tene li heremek anjî bajarek de mahsur bibe pêwîste tekili li sûriyê zêdetir bibe û bi derva re di nav tekîliyan de bin û bi hemû dîplomasiyê derva re tekîlî zêdetir xort bibin. Ger em bixwazin proja netewa demokratîk û pêşketinan di hûndir sûriyê de bidin avakirin, berpirsiyartî mezintir dibe û bar girantir dibe, bê kurd pirsgirêka kurd çareser nabe."




## Xeteriyên li ser pêvajoyê



**Ahmet Aktaş**

Zemînê pêşkeftina vê pêvajoya nuh, gelek hêja û berfireh e.
Belê paralelî vê zemînê erênî, hewldanên nerînî jî ne lawaz in,
Lewma, ji bo pêvajo rast û bêziyan bimeşe, pêdivî bi hişyarî û amadekariyên xurt hene.
Bêgûman ji vê pêvajoyê re, herdu aliyên şer berpirsyarin. Vana jî pêşengê Tevgêra Azadiyê PKK û Rêveberiya dewleta Tirkiyê AKP-MHP ne.
Pêvajo, bi banga Rêber APO ya 27ê Sibatê hat despêkirin.
Piştî bangê 2 rojan, PKKê bersîva erênî da Rêberê xwe û got "em bi tevayî li pey Rêberê xwe ne"! Weke despêkê jî AGIRBES ragihandin!
Heyeta Partiya DEMê ya bi razîbûna herdu hêlan ava bûbû, bêrawestan kar û xebata hêja, heta nuha jî dimeşînin.
Ev hewldanên hêja, ji aliye gel û dostên doza Kurdistanê ve, gelek bi germî û dilxweşî hatin pêşewazî kirin.
Lê, aliyên dewletê AKP-MHPê, gelek bi sistayî û xemsarî nêzî pêvajoyê bûn.
Jixwe AKP, gelek dereng beşdarî pêvajoyê bû, bar bi giranî ket sitikura Devlet Bahçeli.
Jixwe nexweşiya Devlet Bahçelî demek dirêj domand û li pey wî nexweşiya Sirri Sureya Onder kete rojevê!.
Hilbet van bûyeran, di rojeva raya giştî de gûman peyda kirin. Jixwe aliyên xêrnexwaz ên li dijî pêvajoyê, weke 'korê ku kêç bi dest keve' hema bi lez, dest bi propagandayên xerab kirin.
Ji aliyekî ve, maf heye ku hinek kes gûmanan bike li ser bûyerên wisa. Çima?
Du sedemên sereke hene, yek: Di dîroka nêzik a dewleta tirk de, ji bo pêvajoyên wîsa Serokkomar Turgut Ozal hewlda, lê di demek kurt de, bi mirinek gûmanbar koça dawî kir.
Her wiha, Bulent Ecevit, li ser pirsa rojnamevanan got „erê li ser kevirê qebra apê min nivîsî ye Kurd Sadiq". Ew jî, sax çû nexweşxaneya Gulhanê ya leşkerî lê mirî derket!
Mirina general Eşref Bitlisi û ya rojnamevanê navdar M.Ali Birand jî gelek bi gûman e, jiber aliyên wan ên Kurdî.
Sedema dudan: Xemsariya rêveberên AKP û gotinên rêvberên AKP-MHPê yên ne li goreyî ruhê aştî û demokratiyê jî, rê vekirin li ber propagandayên xerabkarên dujminê pêvajoyê.
Li gel xerabkarên hundur ên derve jî ne kêm in. Erê nuha gelek dewlet û saziyên navneteweyî yen mezin, piştgirî dan banga Rêber APO. Lê ev nayê wateya, hemû ji dil û wê herdem piştgiriya xwe bidomînin. Na xêr, piraniya wan, jiber berjewendiyên xwe yên demkî piştgiriyê dikin.
Lewma divê Tevgera Azadiyê û Gelê Kurdistanê, li ber hemû xeteran bi heşyarî tevbigerin.
Bêgûman dostên gelê Kurdistanê yên navneteweyî jî gelek in. Weke mînakekê ji wan, Koordinatorê Netewiyê Partiya Çepa Fransa Jean-Christophe Sellin, di Rojhilata Navîn de hêza herî germ û kêrhatî(ya dînamik), hêzen Kurdistanî nîşan dide û dibêje,"di Rojhilata Navîn de 4 hêzên dinamik hene; yek: Tevgêra Rizgariya Netewiya Kurd a li dora PKKê, dudu: Rêveberiya Xwesera Rojava, sisê: Partiya DEM û çar:Tevgêra Jinê ya bi dirûşma JIN JIYAN AZADÎ li Îranê sarî hilda ne"!
Ev jî tê wateya ku êdî karwanê felsefe û siyaseta Rêber APO ya li ser RÊYA SISYA dimeşin, xwe bi cîhanê jî dane pesandin, oxra wan(me) ya xêrê be!



# Mafê hêviyê yê Rêber Apo henasedayîna mirovahiyê ye

**Argêş Vîyan**

Rêberê mirovahiyê ji 15'ê Sibata 1999'an ve têkoşîneke bêhempa dide meşandin û tevî hemû bê derfetiyan jî li ber xwe dide. Ev di dîroka cîhanê de cara yekeme û ti hevşibandina wê jî nîn e. Ji bona mirov wê têkoşîn û berxwedaniya Rêber Apo ya li Îmraliyê fêm bike û wate bidê, pêwiste mirov destpekirina Rêber Apo ya şoreşê û damezirandina Tevgera Azadiyê lêkolîn bike. Rêber Apo di sala 1971'an de li Zanîngeha Stenbolê Fakulteya Hiqûqê tomar kir, di heman salê de derbasî beşa Zanistên Siyasî ya Zanîngeha Enqereyê bû. Ev bû sedemeke bingehîn ku ew ji nêz ve pirsgirêka kurd ku bi sedan sale bûye navenda xwîn û aloziyê ji nêz ve bişopîne. Rêber Apo jî dizane, ev pirsgrêk agir e û yên ku xwe nêzî wê dike dişewite. Gelek kes û rêberên kurdan yên mîna Şêx Seîd, Seyid Riza, Şêx Mehmûd Berzencî, Qazî Mihemedan û gelek kesan di oxira vê pirsgrikê de canê xwe feda kirin û hatin darvekirin. Lê ti kesî nekarî pêngavekê xurt bavêje û çareser bike. Dema Rêber Apo hin tiştan dibîne û dahûrandinê dike kale mêrekî Kurd jêre dibêjê "Darê



ku ziha bûye çawa tê şîn bike?" Rêber Apo ji serhildanên ku hatine jiyankirin ezmûnên efsûnî girt û dara ku ziha bibû, ne tenê şîn kir, di heman demê de fêkiyê wê darê jî çêbûn. Ev kesên ku kurd weke civak û weke kes ne dihesibandin, niha civînên ku Kurd nûnertiya wê nekin, ew bê bawer nêz dibin. Ev bi saya têkoşîna Rêber Apo ya girava Imraliyê ya salan e ye. Nijadperestekî wekî Dewlet Bahçelî ikna bûye ku bê Rêber Apo û Tevgera Azadiyê ti çareserî wê ne pêkan be. Rêber Apo di heman demê de cîhan tev da fêmkirin. Ji ber ku heta niha wekî birdozî û têkoşîna Rêber Apo nehatiye dîtin. Ev raman û felsefe, ramanên mirovahî û gerdûnî ne. Damezirandina Tevgera Azadiyê bi 22 kesan dest pê kir, niha tovê xwe avêt û gehişte milyonan kes û civakan. Bi ked û xebata Rêber Apo kesên li gund mezin bibûn qet çavê dibistanê ne dîtibûn, bi perwerda Rêber Apo qasî mirovên zanist û zêdetir jî xwe perwerde kirin û bûn pêşengên civakê. Bi gelek kesên kurd re hevdîtin kir û ji bona di navbera hemû beşên Kurdistanê de, sînoran rake û kurdan bike yêk, têkoşîneke bêhempa da meşandin. Ev yek jî pêk anî û hêvî û armanca kurdan di dorhelekê re kir yek. Başûr, Rojava, Bakur û Rojhilatê Kurdistanê kirin yek beş, yêk fikir û yêk armanc. Bi birdoziya xwe pêşeng ava kirin û hêza civakê xurt kir. Ji ber ku mirovahî kir yêk rêz, Rêber Apo hat dîlgirtin û xwistin ku wî di nava giraveke tarî û veşartî de bihêlin. Lê nekarîn pêşîya birdozî û ramanên rastiyê bigirin. Raste mafê wî yê hêviyê jê hat sitandin, lê Rêber Apo hêviyên xwe mezintir kir û fikra xwe belavî hemû gerdûnê kir. Ji xwe sedema bingehin jî ew e ku raman û fikrên Rêber Apo ji bona mirovahiyê ne û pêwist e bi lezgîni mafê Rêberê mirovahî û demokrasiyê Reber Apo re mafê heviyê bê dayin. Ji ber ku Rêber Apo bi banga xwe ya çareserî û azadîxwaziya pirsgirika Kurd ya ku bi "Agir" dihate binavkirin kir. Hêviyan xêlaskirina gengeşî û aloziyên hezaran salan li serê mirovahiyê bûye bela da hemû cîhanê. Ji ber ku ev hêvî ji bona hemû gerdunê taritiyê derbasbûna ronahiyê ye. Mafê Hêviyê ji nan û av girîngtir e ji bo Rêber Apo. Em wê tiştê ezmûnan salan jî dane diyarkirin dibêjin "Mafê hevîyê ya Rêber Apo hênasedayina mirovahîyê ye" Ji ber ku Rêber Apo sedema bingehîn ya hênase girtina gelê Kurd û civakên azadîxwaz e û pêwiste lezginî mafê Rêber Apo yên xwezayi bê dayin û pêşiya azadiya Rêberê gelan bê vekirin.

# Piştî peymana Şêxmeqsûd û Eşrefiyê... gavên pêşveçûnê

**Esma Mistefa/Qamişlo**

**Hevseroka Şaredariya Gel a Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Emîne Bêrem da zanîn ku wê bi rêya van lihevkirinan xebatên şaredariyê di her du taxan de bi pêş bixînin û got, "Da ku xebateke hevbeş bê kirin, wê di asta giştî de komîte werin avakirin."**

Di 1'ê Nîsana 2025'an de rêkeftineke ku ji 14 xalan pêk tê di navbera Mecisa Giştî a taxên Şêxneqsûd-Eşrefiyê û desthilata Şamê de hate îmzekirin. Di rêze pêkanîna xalên vê lihevkirinê de gavên berbiçav tên avêtin. Herî destpêkê serbestberdana girtiyan di navbera her du aliyan de bû, her wiha rakirina bendên ku beriya 4 mehan bi geşedanên ku rûdan re hatibûn danîn û parvekirina rêvebirina xalên kontirolê ji aliyê her du aliyan ve bû. Di van lihevkirinan de xweseriya taxê di aliyê rêxistinbûnê de tê parastin û bi awayekî hevbeş û bi tensîq wê xebatên parastin û şeredariyê bên kirin.
Têkildarî xebatên şeredariya Gel a taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê li Helebê piştî peymana bi desthilatdariya Şamê re, hevseroka Şeredariya Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Emîne Bêrem ji rojnameya me re axivî.

**'13 salan her du tax li hemberî şer, siyaset û dorpêçê, nirxên şoreşê parastin'**

Emîne Bêrem di destpêkê de behsa rewşa her tu taxan di dema Rêjîma Baas de kir û wiha anî ziman: "Piştî 13 salan ji şer û pevçûna ku di dihate jiyankirin, bajarê Helebê û bi taybet her du Taxên Kurdewarî yên ku bi berxwedaniya gelê xwe di şoreşa Rojava de hati naskirin; Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên ku di vê şoreşê de bedelên herî giran dan lê rûxmî her tiştî jî dev ji parastina her du taxan bernedan.
Helbet di nava van salan de piştî bidawîbûna şerê leşkerî, siyaseteke birçîbûn û xeniqandinê li ser gelê taxê hate destpêkirin. Siyaseta dorpêçê bi gelek ziraviyên wê dihat pêkanîn, di aliyê xizmetguzarî, tenduristî, tîcaret û pêşxistina pêşesaziyê de her wiha di aliyê girtina ciwanan de dihate meşandin. Hikumeta Baas li derdora her du taxan ku 7 korîdorên wê hebûn giropên leşkerî yên herî xirap a ku bi navê (Firqeya 4) tê naskirin belavkiribûn. Rêjîma Esed rê nedidan ku sotemenî, derman û alavên tenduristiyê derbasî her du taxan bibin. Di heman demê de gel ji elektirîk û avê bê par bûn. Li pêşiya hebûna elektirîk û avê dibû bend û astengî derdixistin. Ev yek jî rê li ber kişandina gelek zehmetiyan vedikir. Gelê ku li vir jiyan kiriye rastî gelek êş, azar û zehmetiyên rêjîma hilweşîner hatin.
Emîne wiha dewamî da axaftina xwe: "Li hember rêjîma berê gelek berxwedanî hate kirin, gel tevî saziyên xwe têkoşîneke parastina nirxên vê şoreş kirin. Me jî bi derfetên herî kêm, tiştê ku ji destê me derdiket me dikir û bi gelê xwe re xebatê şeredarî, rêxistinbûn û xizmetê dikir".

**'Armanc parastina ewlehiya gel û avakirina aramiyê ye'**

Emîne bal kişand ser girîngiya lihevkirina ku hatiye kirin û wiha bi lêv kir: "Piştî hilweşîna rêjîma berê û hatine hikumeta nû a şamê, helbet gelek guhartin û geşedanên siyasî, dîplomasî û leşkerî hatin pêkanîn. Di nava van guhartinên dîrokî de helbet gelê Kurd sîstema Sûriyê a berê ku niha jî li ser wan bê meşandin ji ber wê jî gelê kurd bi hêza xwe di dengeyên Sûriyê ê nû de xwedî rorele sereke ye û ev yek jî di lihevkirin, têkilî û siyaseta ku tê dîtin de, xuya dike. li ser van bingehan di demên dawiyê de lihevkirinek di asta giştî de hate kirin, her wiha ji bo taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê rêkeftinek ku ji 14 xalan pêk tê hate îmzekirin. Di vê peymenê de gelek xalên girîng ku dikevin xizmeta gelê me yên her du taxan kete meryetê.
Armanca sereke ji vê yekê ku siyaseta berê li ser texê û gelê wê dihate mneşandin careke din dubare nebe. Ji ber me berê jî digot û em niha jî dibêjin her du tax beşek ji xaka bajarê Helebê ne û divê tu siyaset li ser wêpê neyê pêkanîn. Ji lewra armanca me em bikaribin bi riya van lihevkirinan kêmesî, zehmetî û astengiyên gel derbas bibin, her wiha em di atmosferekî aştî û aram jiyan bikin. Hêviya me jî bi vê yekê ku



Sûriyeke demokratîk ne navendî û tê de mafê hemû gelan û pêkhateyan bê parastin e".

**'Bi rêya avakirina komîteyan wê xebat hevbeş bê kirin'**

Emîne Bêrem da zanîn ku wê xebatê şeredariyê bi avakirina komîteyan bi desthilata Şamê re were pêşxistin û wiha qedand: "Di aliyê xizmetguzarî de wê xebatên şeredariyê di asteke baş de bê pêşxistin. Her çiqas em xebatê şeredariyê xurt û aktîv bikin wê ewqas rihetî di nava gel de avabibe. Bi rêya vê lihevkirinê emê astengiyên berê ji tunebûna derman, sotemenî, pêşxistina tîcaretê û aboriya gel, her wiha peydakirin û bicihanîna pêwîstiyên gel û avakirina binasaziyê wê bêne bicihkirin. yek ji bendên vê rêkeftinê jî ku satirên derdora taxê bêne rakirin ev yek jî ji aliyê her du şeredariyan de hate pêkanîn. Helbet xebatên me di demên pêş de wê bi awayekî tensîq û avakirina komîteyên avê, kehrebê, û hwd, herwiha wê di asta giştî de komîte bê orgenîzekirin da ku têkiliyên me bi hev re xurd bibin û rewşa taxê ji rewşa giştî a bajarê Helebê ne cuda be".

**FENER**

## Li Sûriyê Sîstema Transît û qeyûmtiya Tirkiyê



**Idrîs Henan**

Geşedanên siyasî li Sûriyê yên piştî serdema hilweşîna rejîma Baas û dîktatoriya mala Eseed, heta radeyek baş diyar dikin ku reftarên desthilata heyî ne dûrî yên rejîma berê ne û haya mirovan jê çêdibe ku koma nû ya desthilatdariyê rûbirûyî aloziyên mezin e. Kêşeyên heyî jî xwe dispêrin çend jêderên hindirîn û hinek derve. Ango ji bilî bermahiya giran a rejîma ketî ya Eseed û sepandinên hêzên destwerdanê, hişmendiya ku desthilat xwe dispêrê jî, bûye bar û navendek kirîzê. Kirîz jî xwe spartiye paşxaneya bîrdoziya selefî ya tundrew ku di nava koma xwe ya mezhebî de bûye hindikayî û jêdera kaosê.
Aliyek din jî ya kirîza ku îro di kesayeta desthilata Şamê de beloq bûye ew e ku xwe bi giştî spartiye berjewendiya dijniştimanî ya pala xwe dide bicihanîna çiqarên hêzên destwerdanê. Lewra diyardeyên mîna ewlehî, dadweriya veguhêz, aştîtiya sivîl, qebûlkirina cudahiyên olî û etnîkî, yekîtiya axa Sûriyê û jihevxistina yapiya paredîgmaya tundrew, bûne belayên exlaqî li ser milê desthilata nû. Jêdera belayê jî ew e ku bi rêgez û prensîbên dijberî baweriyên xwe yên rasteqîn re, aliyê şikil ve, xwe rave dikin. Ew jî ne rasterast xapandin be, ancax xwe nixumandin be.
Tabî ew desthilatdarî jî baş têdigihêje ku şert û mercên herêmî û navdewletî avantajek daye wê ku hêzên herêmî û navneteweyî bi lez, li gorî hinek angaştan hebûna wê li ser dika desthilatdariya Sûriyê qebûl bike. Ji bo wê jî qebûlkirinek bi sosret bû! Lê naveroka berjewendiya projeya navenda hegemoniyê ku bi êrişên Hemasê yên 7 Cotmeha 2023`an li ser Îsraîlê re, şiklê guhertiye, bi awayekî xwezayî rê li ber hilkişîna sîstemên tundrew vekiriye û li şûna rejîmên netewperest ên rizyayî bi cih kirine. Ev nayê wê wateyê ku netew dewlet ne bijardeyek hegemoniyê ye, berevajî wê yekê, xwevehesandin, nefeskişandin û xwenûkirina navendê û derdorê bi hev re ye. Lew re, serweriya rejîmên tundrew ên selefî, îstisnayek demkî ye. Kengê sîstema global biçimê xwe bigire û şerên aborî û bazirganiyê yên navbera hêzên xwe li hev radikişînin de bigihêje encamê, wê çaxê tu hewceya "rejîmên transît" ên tundrew namîne.
Xuyaye rejîma HTŞ ku sûd ji rewşa Şerê Cîhanê yê Sêyemîn girtiye û bi îradeya hegemoniyê jî li Şamê bûye desthilat, dixwaze bibe destpot û bi tiyatroyên klasîk ên xwe dispêrin dibistana rejîma Baasê, li pey sepandina bi zorê ya desthilatdariya xwe ye. Vê yekê jî bi perspektîfên rejîma destpot a bi ezmûn a Tirkiyê dike. Ango; ji xweşibandinekê wêdetir, xweradestkirin û xweavêtina hembêza rejîma Tirkiyê ye. Lew re jî, tişta bi navê; Kongreya danûstandina neteweyî, deklerasyona makezagonî û hemû biryarên erkdarkirina çeteyên Tirkiyê yên destê wan di xwîna gelên Sûriyê de heye, hîkaye û talîmatên Tirkiyê bi xwe ne. Dewleta Tirk a dagirker çawa li Kurdistanê destkeftiyên gel desteser dike û qeyûman erkdar dike, li Sûriyê jî di rewşa qeyûmtiyê de ye. Rojane wezîrê wê ya karê derve û rayedarên wê yên dîtir, li ser navê hikûmeta HTŞ'ê daxuyaniyan didin û ji nifûsa gelên Sûriyê heta şiklê rêveberiya welat tayîn dike. Ji xwe mudexeleya wê jî bi komkujiyên li Beravê û kiryarên revandin, kuştin, intîqam, dijatiya ji pêkhateyên olî û etnîkî li hemû deverên Sûriyê tacîdar bû. Lê ev konsepta Tirkiyê ku bi serpereştiya HTŞ, hêzên weke DAIŞ û çeteyên biyanî di dewrê de ye, dê neçe serî ku rojane daneheva baweriya navneteweyî pê kêm dibe û paş ve diçe. Yanê, hêviyên hindirîn, herêmî û navnteweyî yên li ser rêveberiya desthilata HTŞ, bi xwespartina ji Tirkiyê re, bê wate man û baweriya ku bibe rêveberiyek cudayî desthilata berê, lawaz bûye. Lew re, bi vê miçmiç û fezlekeyên derbarê demokrasî û laîkiya Sûriyê û sîstema pirengî ya nenavendî de, wê veguherîne desthilateke transît dê bi xilasbûna berjewendiya ku hebûna wê hewce kiriye re, biqede û têk biçe.